Newroz Hejmar (70) Rûpel (12) Çirya Pêşîn 2006z – 2618k

Dawiya Zordariyê rûreşî ye

Dîlan Zivingî

Piştî Sedam Husên , xwinvexwarê gelê Îraqê , yê dîktetor û setemkar ,di zêrzemîn û berqefan de dihate girtin . Ew davêtin binê hebis û zîndanan . Wehan jî , li-9-ê Nsana - 2003-an , weke şaneke pîrozî û azadiyê li gel xelikê Îraqê , nemaze li ba gelê kurdistanê dibû rojek bi nîşan. Ew ji bin nîrê hovîtiya Sedamê bêbexit rizgar bûn . Lê belê, tiştê bêtir dilê mirov hênik û rihet dikir. Dema ew, bi rengekî aşkere , li pêş xelikê cîhanê tev , di qanalên têlvizionî esmanî de dadixistin pêş dadigehê, da ku setemkariya Sedam û duvçilên wî bibînin û nasbikin . Belikîm , rijîmên derdora Îraqê, yên mîna dîktetor Sedam , pir sûdan , ji vê bûyerê werbigrin .

Pir heyif û mixabin ku , li beramberî evqas sal, zor û setemkarî, li serê gelê me yê kurd , li wêrê dikir û herweha li serê gelên Îraqî dimeşand. Daxwez û armanca wan (Sedam û dûvcilan) ku, gelê kurd tarûmar û tune bikin .

Lê, weke helibestvanê kurd yê nemir Yonês Dildar , di sirûda Eyreqîb de , herdibêje: Kes nebê kurd mirdiwa Kurd Zindiwa .

Ma gelo! Tu hêz , dikarin hebûna bêtirî çêl miliyon kurd, li darê dinyayê tarûmar û tune bike. Ev miletê ku , ji evqas sal ve, li ser xaka bav û kalên xwe cîwar e. Xwedî dîrok , ziman û tore ye. Lewre jî, divê tev baş zanibin ku , miletê kurd xwedî dozeke rewa û dadimend e. Dem ne dema pişaftina miletên mîna gelê kurd e.

Wisan jî, xelikê cîhanê tev, li pêş alavên ragihandinê yên bi kêrhatî, li dawiya mirovekî mîna Sedam , ku cezayê darvekirinê pê hatiye wergirtin. Hê jî doza kurdên Enifal û Helebçe , li dadegehê berdewam e . Tenê, di doza dicêl de , sezayê darvekirinê,bi wî û Berzan Tekirîtî û Ewad Elbender ve hate standin.

Wisan jî, li -5-ê çirya duwem, di rûpela dîroka Îraqê de, mîna xaleke geş cî digirtî. Xelikê ducêl, di vê rojê de, aheng li dar dixistin ! Ma gelo! Çiqas car, ew û duvçilên wî , hêjayî darvekirinê ne. Vêca jî, pir pir pêwîste, ku her rijîmek , zor û lêdanê , li serê gelên xwe, nemaze li serê miletê Kurd dikin , ciqas giringe , ku ew rojekê pêş ve , li xwe bizîvirin, sûd û îbiretên xwe , ji Sedam û berdefkên wî bigirn û hilînin. Ji ber ku , dawiya zordariyê rûreşî ye û rojên li pêş yên miletên bindest e .Ne wilo ? Ma xwendevanên Newroza me ,çawa dibînin û çi dibêjin?.

Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de